

*Amanita virosa*

### *Amanita virosa*
**(Norwêcî: Hvit fluesopp)**

Tevaya kumikê (kivarikê) sipî ye (kum, qurm, tebeqe û goştê kumikê). Liser qurmê kumikê xelekek heye, lê ew carna jêde dikeve. Beşê jêrîn yê qurm dinava qalikekî (tûrikekî) de ye. Li daristanan ev kumik pir heye.



*Amanita phalloides*

### *Amanita phalloides*
**(Norwêcî: Grønn fluesopp)**

Rengê kumê vê kumikê tê guhertin, û ew yan kesk yan qehwehî û yan jî zer e. Rengê tebeqe û qurmê kumikê sipî ye.  Liser qurmê kumikê xelekek heye, lê ew carna jêde dikeve. Beşê jêrîn yê qurm dinava qalikekî (tûrikekî) de ye. Ev cûreyê kumikan kêm e.



*Galerina marginata*

### *Galerina marginata*
**(Norwêcî: Flatklokkehatt)**

Rengê kumê kumikê û tebeqeyên wê zerqehwehî ye. Rengê qurm tê guhertin, ew yan risasî ye û yan qehwehî ye. Ev kumik biçûk e û bi asayi gelek kumik bi hev re liser qaşûl û qurmên daran didine der. Ev cûreyê kumikan pir belav e.

## Bijehrbûn

Miqdarekî biçûk jî ji van her sê kumikan dikare mirov bi giranî bi jehriyê bixe. Piştî nêzîkî 6 saetan zikêşeke giran bi mirov re çêdibe û avdesta mirov jî rihn dibe. Ji xeynî wê zikê mirov dêşe û dilxelandin bi mirov re çêdibe. Metirsiyeke mezin heye ku belayek e mezin dinava 2-3 rojan de bighije cegerê mirov û jiyana mirov bikeve tehlûkê. Dema tu bi guman bê ku te kumikên jehrdar xwarine, peywendiyê bi Nivîsgeha zanyariyan derbara jehrê (Giftinformasjonen) re bike da ku ew te şîret bikin derbara lênêrîn û guhdana lazim de paşê.



*Cortinarius rubellus*

### *Cortinarius rubellus*
**(Norwêcî: Spiss giftslørsopp)**

Rengê kumikê tevî sorqehwehî ye (kum, tebeqe, qurm û goştê kumikê). Ev kumik li daristanan blav e. Ew li eynî deverê weke kantarêlên kovikî (traktkantarell) çêdibe.



*Cortinarius orellanus*

### *Cortinarius orellanus*
**(Norwêcî: Butt giftslørsopp)**

Ew dişibe Kortînarya kujer, lê belê kumê wê qalind û girover e. Ev texlîtekî kumikan e ku kêm e û li daristanên darpelan şîn tê.



*Cortinarius rubellus û Craterellus tubaeformis*

### Metirsiya şaşbûnê

Rûdêna kortînarya kujer (spiss giftslørsopp) û kantarêlên kovikî (Craterellus tubaeformis) ne weku heve, le ew li eynî cihî şîn tên. Ji ber vê yekê hesaniye ku mirov bi xwe re hin kumikên ji texlîtê kortînarya kujer bîne eger mirov her kumikeke kû mirov diçine xweşik fehs neke.

## Bijehrbûn

Miqdarekî biçûk jî ji kortînarya kujer yan kortînarya kujerî dorqalind têde wilqas jehr heye ku heye belayek e mezin bighîne gurçikan. Ancex piştî 36 saetan simptômên bijehrbûnê kifş dibin, û ew jî dilxelandin, êşa zik, hestkirineke giştî bi nexweşbûnê û zêdebûn yan kêmbûna mîzê ne. Metirsiyeke mezin heye ku mirov dinava 3-6 rojan de tûşî têkçûna (feşela) gurçikan bibe. Dema tu bi guman bê ku te kumikên jehrdar xwarine, peywendiyê bi Nivîsgeha zanyariyan derbara jehrê (Giftinformasjonen) re bike da ku ew te şîret bikin derbara lênêrîn û guhdana lazim de paşê.

*Amanita muscaria var. muscaria / var. regalis / pantherina*

**(Norwêcî: Rød/brun- og panterfluesopp)**



Tebeqeyên van her sê mêşkumikan sipî ne û qurmên wan bi xelek in. Piyê qurmê wan werimî ye. Rengê kumê kumikê bi sore ve ye yan jî qehwerengî ye kû têde deqên sipî hene.

### Bijehrbûn

Di van her sê mêşkumikan de jehrek heye ku bandorê li sîstema rehan (eseban) dike. Pirê caran sîmptom dinava ½ -3 saetan de piştî xwarina kumikan tên. Miqdarekî biçûk jî heye bibe sebeba serlêşêwandinê, gêjbûnê, lerzîna masûlkan û êşa zik. Bijehrdarbûna metirsîdar kêm çêdibe, lê xwarina miqdarekî zêde heye bihêle ku mirov mehtêcî dermankirinê li xestexanê bibê.

*Paxillus involutus*

**(Norwêcî: Pluggsopp)**



Rengê kumê kumikê qehwehî ye û kenarê wê berbi hindurû ve tewandî ye. Qurmê wê qehwehî ye û rengê tebeqeyên wê di bin fişarê de tarî dibin. Kumika singikî pir belav e.

### Bijehrbûn

Di kumika singikî de pir jehrên cuda hene ku sîmptomên cuda li cem mirovan peyda dikin. Sîmptomên verîşandinê, zikçûnê û êşa zik heye dinava ½ -3 saetan de piştî xwarina kumikan bi mirov re çêbibin. Piştî xwarina kumikên singikî ku çend carekî bi germkirinê hatine çêkirin, hatiye dîtin ku mirov bi giranî bi jehrdar dikeve û bela jî dighije şanikên xwînê û gurçikan.

*Leccinum versipelle*

**(Norwêcî: Rødskrubb)**



Rengê kumê vê kumika borîkî sorqehwehî ye û liser qurmê wê yê sipî kakilkên sipî hene. Rengê goştê kumikê tarî dibe dema ew tê birîn. Ev kumik li seranserê welêt peyda dibe.

### Bijehrbûn

Kumika pirteqanî kumikeke ku tê xwarin eger ew bi kêmayî 15 deqîqeyan bi germkirinê werê çêkirin. Bi texmîn kumika pirteqanî ya ku baş bi germkirinê nehatiye çêkirin, dibe sebeba bêhtirîn haletên aciziya zik li Norwêc. Dilxelandin, verîşandin, zikçûn û êşa zik pirê caran piştî çend saetan ji xwarina kumikan bi mirov re çêdibin. Bêhtirê wext piştî ji 1-2 rojan sîmptom namînin. Lê eger mirov gelekî bixwe heye ku sîmptomên aciziya zik pir dijwar bibin û mirov mehtêcî razandinê bibe li xestexanê.

**Wêne: Per Marstad**

Norwegian Institute of Public Health

# Kumikên jehrdar li Norwêc



Li daristanan kumikên (kivarikên) ku têne xwarin, yên ku nayêne xwarin û kumiken jehrdar şîn tên. Li Norwêc hin ji wan kumikên jehrdar wilqasî dişibine hin kumikên ku li hin welatên din têne xwarin ku carna mirov wan ji hev dernaxê. Vêce eger tu bi guman bê, peywendiyê bi Nivîsgeha zanyariyan derbara jehrê (Giftinformasjonen) re bike.

## Çend şîretên baş li dema çinîna kumikan:

- Tenê wan kumikan bixwe ku tu 100 % ji wan ewle yî.
- Qet kumikên nenas bi hênceta ceribandinê tam neke! Tama kumikên jehrdar jî carna sivik e.
- Nivîsên nûjen derbara kumikan bikarbîne.
- Hemû kumikên kurmî yan efnikî bavêje.

**Nivîsgeha zanyariyan derbara jehrê (Giftinformasjonen)**
Tel.: 22 59 13 00 (døgnåpent)
**www.giftinfo.no**

Broşûr ji aliyê Nivîsgeha zanyariyan derbara jehrê (Giftinformasjonen) ve hatiye amadekirin (www.giftinfo.no). Tu dikarê broşûreke ferehtir bi zimanê norwêcî ji malperê daxê.
Yekîtiya kumik û giyayên sûdmend li Norwêc (Norges sopp- og nyttevekstforbund) (www.soppognyttevekster.no) kursan drbara kumikan û kontrolkirin û naskirina wan de tenzîm dikin.
2018